BastA!
Basels starke Alternative

# VÎZYONE ME

Em ji cîhaneke ku di bin fermana kapîtalîzmê de ji krîzekê ber bi ya din diherike bêzar bûne. Em ji bikaranîna mirov û xwezayê ya ji bo qe-zenckirina kedmejîya berjewendî bêzar bûne. Em ji vaca (mantiqa) serdest a dijberî û mezinbûna aborî
bêzar bûne. Ji ber vê yekê em wek BastA yekgirtî ne!

Wek partiyeke femînîst, ekososyalîst, em li ser ji nû ve dabeşkirina dem, hêz û pereyan a radîkal dixebitin. Em ji bo şoreşeke civakî ya ku jiyana xweş ji bo herkesî dike navendê armanca xwe tekoşîn dikin. Hevgirtina me ji bo hemû mirovên cîhanê re ye ku li dijî bêdadî(nehe-qî) û zordarî têdikoşin û doza jiyaneke azad û bi rûmet dikin.

Şerê wan şerê me ye jî. Bi hev re em bi dilxwazî ji bo cîhanek bê hejarî, birçîbûn, şer û cihêkariyê (diskriminierung)hewl didin.

Em dixwazin Basel ji bo hemûyan bibe bajarekî kesk û jiyanbar. Ji ber vê yekê em hewl didin ku cîh û warên jiyanê bi beşdarîya çalak a miro-vên ku li wir dijîn werin sêwirandin(dizayn kirin). Em ji bo dadweriya avhewayê, dadweriya bacê û ji bo ku mafên bingehîn û mafên miro-van her dem, li her deverê û ji bo her kesî werin sepandin hewl didin.

Guhertina civak li her derê tê destpêkirin dema ku mirov bi hev re li dilgiranî û pirsgirêkên xwe xwedî derkevin. Ji ber vê yekê em di nav tevgerên civakî, queerî, antî-nîjadperestî , femînîstî û ekolojîk de, li meclîs û taxên me de,cîh digirin.

Em dixwazin ji hev û bi hev re fêr bibin. Hem li derve û hem jî li hundir, em li ser qadên
necudakar ji bo danûstandina vekirî û nîqaşên çêker dixebitin.

Cîhanek din gengaz e. Werin em tevbigerin!